Gele pirs hene, divê em ji bo peydakirina bersivên wan guftûgo bikin? Rojnamevan xwe bi xwe, û rojnamevan û desthilatdar!?.

Divê armanca me ya hevbeş ev be: azadiya nerînê, azadiya derbirînê û azadiya ragihandinê. Beramberî wan: xebata pîşeyî, liva bi berpirsyarî û rêzgirtin.

***Birêvebirê Giştê yê Saziya ARTA ji bo Ragihandinê (facebook.com/sberko)**

Rojnamegerî, Şoreş û Rojava..

"Karesata herî mezin di lawazbûna rojnamegeriya Kurdî de, ne tenê di rojnamevan de ye belku di berpirsên hizbî û serkirdeyên hizban de ne jî ku dema daxuyanî yan çavpêkeftinekê yan gotarekê pêşkêş dikin û diaxivin ji bo berjewendiyên xwe ên şexsî û bi bê berpirsyarî diaxivin, ev e bandora xwe ne tenê li ser kadirên hizbî belku bandora xwe li raya gitşî jî dike, nexasim dema ew serkirdeyan berpirs diaxive hesabê hestên aliyê beramber yan rikber nake".

Nivîskar û rojnamevan: Dawud Çîçek

Rojnamegeriya Kurdî weku gelê Kurd dîroka wê ya gelekî dijwar ji inkar, îmha, komkujî, şer, şoreş, parçebûn, bindestî û zordestî, di gelek qonaxan re derbas bûye, di 22 nîsana sala 1898`an de dema mîr Miqdad Midhet Bedirxan yekemîn rojnameya Kurdî li Qahîreyê çap kir, di wê demê de mîr Miqdad Bedirxan behsa armanca çapkirina rojnameyê dike û dibêje: "Navê vê cerîdê min kiriye (Kurdistan) di vê cerîdeyê de ez ê behsa qenciya ilim û meirîfetan bikem. Li kû derê mirov di'elime, li kû derê medrese û mektebên qenc hene ez ê nîşa kurdan bikem, li kû derê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawa şer dikin, ticaret çawa dibe, ez ê hemiya hikat bikim."

Di vê serdemê de ku rojnamegeriya Kurdî ya nivîskî, Elektronîk, bihîstî û dîtî, hatiye asteke bilind û bi dehan rojname û radyo û kanalên telefizyonê yên Kurdî hene, doza Kurdî li hemû cîhanê bi saya şoreşa Rojavayê Kurdistanê û berxwedana gelê Kurdistanê li dijî neyarên mirovahiyê ketiye rojevê, lê mixabin rojnamegeriya kurdî li Rojava negihêştiye asta xizmetkirina doza rewa ya gelê Kurd û di berjewendiyên hizbî yên teng de maye!?.

Bi dîtina min rojnamegeriya Kurdî beriya her tiştî divê xizmeta şoreşê û doza netewî ya gelê Kurd bike, rastiya şoreşê, qehremanî, fedekarî û têkoşîna gelê Kurd a ji bo demokrasî û azadiyê û mafên xwe yên rewa ji cîhanê re bide nasîn, wekî çawa berxwedana Kobanê cîhan rakir ser piyan û hemû çapemeniya cîhanê berê xwe dan Kobanê dişopand û di hemû çapemeniya cîhanê de şervanên (YPG,YPJ) bûne mînaka berxwedana li dijî hêzên terorê, her weha serkeftina Kobanê jî hêviyek mezin da tevahiya cîhanê ku gelê Kurd xwedî heqe û bi hawara Rojava ve hatin û destê alîkariyê dirêjî Rojava kirin. Ev e jî jiber xwe ve nehat, helebt bi saya berxwedana gelê Rojavayê Kurdistanê û qehremaniya şervanên (YPG,YPJ), xwîna şehîdan û dîplomasiya Kurdistanî û yekîtiya hemû aliyên Kurdistanî ji bakûr, başûr ta rojhilatê Kurdistanê hatiye encamdanê.

Rastiyeke heye ku rojnamegeriya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê hizbî ye û zimanhalê partiyan e, dijberî û nakokiyên di nava partiyan de jî bandorek xirap li ser rewşa Rojavayê Kurdistanê dike û civakê parçe dike. Bi baweriya min pêwîstiya Rojava bi rojnamegeriyeke dûrî bandora hizbayetî heye ku bikare nêrîn û dîtinên hemû cîvakê bixe berdestê raya giştî li Rojava û bikare nêrînên hemû partiyan û nakokiyên heyî û xalên dijber aşkera bike, pêwîst e rexnegir be û xalên pozetîf nêzîkî hev bike, daxuyaniyên tekalî li ser mijarekê na, divê daxuyaniyên du, sê ,çar aliyan li ser mijarekê bigre dest, bi vê yekê bikarin xalên hevbeş bi ronakî derxîne holê. Divê hemû pênûs cext li ser yekîtiya netewî û serkeftina şoreşê û destkeftên heyî bikin.

Karesata herî mezin di lawazbûna rojnamegeriya Kurdî de, ne tenê di rojnamevan de ye belku di berpirsên hizbî û serkirdeyên hizban de ne jî ku dema daxuyanî yan çavpêkeftinekê yan gotarekê pêşkêş dikin û diaxivin jibo berjewendiyên xwe ên şexsî û bi bê berpirsyarî diaxivin, ev e bandora xwe ne tenê li ser kadirên hizbî belku bandora xwe li raya gitşî jî dike, nexasim dema ew serkirdeyan berpirs diaxive hesabê hestên aliyê beramber yan rikber nake, gotina xwe dibêje û dimeşe. Ev jî karesata herî mezin e, çareseriyê nayne berovajî wê kîn û nefretê bi xwe re tîne.

Rojnamegerî di demên şoreşê de cudatir ji ya piştî şoreşê, divê rojnamegeriya Kurdî di vê dema ku Rojava tê de derbas dibe li hemberî hemû metirsiyên li ser gelê Kurd hene û rewşa şer tev bigere hemû tişt divê bikeve xizmeta şoreşê, xizmeta rêveberiya ku niha li Rojava heye, bikare êş û azarên gelê xwe bighînin hemû cîhanê û itûrafeke navdewletî bê qezenckirin.

Rojnamevan li Rojava divê bi rihekî şoreşgerî jiyana xwe organîze bike daku bikare rastiyan û nêrîna azad bighîne civakê û rihê yekîtiyê û hevgirtinê ya netewî di dema niha de berceste bike. Rojnamegerî bi serê xwe jî rolekî mezin di serkeftina şoreşê de dilîze û ew bi xwe jî şere û çekekî du seriye ger baş neyê xebitandin wê ziyanê bighîne doza netewî û gel.

Li dawiyê dixwazim bêjim ku mixabin heya ku rewşa partiyên me ên Rojava weha parçekirî û nakok be rojnamegerî li Rojava wê nikaribe bi erkê xwe rabe û yê lawaz û hejar bimîne û rojnamevanên me jî wê li berbayê hizbayetiyê bikevin û wê nekaribin nêrîna

Piştî 117 Salan Rewşa Ragihandina Kurdî:?!

"Çawa çapemenî û ragihandin guh û çav û zimanê gel e, her wiha ew pêwîst e heman demê wicdanê civakê be, û bi hişmendî û hişyariyek netewî û insanî û meslekî karibin vî erkê xwe yê çapemeniyê bikin".

Besam Xelo

Ev roj em cejna çapemeniya kurdî bi salvegera 117mîn de pîroz dikin, rojnameya bi navê Kurdistan ku yekemîn car li İstanbulê derket di sala 1897, û paşî li Misir-Qahîre di sala 1898 ji aliyê Midhet bedirxan ve hate derxistin, û her wiha piştre ev rojname li Cinêv û Folkistan û Londonê hate çapkirin.

Dema ku dewleta Osmanî, di zagona xwe de rê da weşana çapemeniyê, dîsa rojnameya Kurdistan li ser destê Surreya Bedirxan vegeriya İstanbolê û li wê derê hate çapkirin, heta destpêka şerê cîhanê ê Yekemîn. Û ta niha hejmarên rojnameya Kurdistan ji 1-31 hejmar li pirtûkxaneya Brûsya (Almanya) tê parastin.

Ji dervey rojnameya Kurdistan, rojnameya Roja Kurd û Jîn weke rojnameyên heftane li İstanbolê, di sala 1919 dihatin çapkirin li ser destê mamosta Hemze û Memdûh selîm. Rojnameya Pêşkewtin û Bangê kurdistan, di sala 1922an li Silêmaniyê ser destê Fayiq hecî mustafa derdiket, û di dema Şêx Mehmûd berzencî de, rojnameya bi navê Roj Kurdistan heftane dihate weşandin. Di sala 1925 de rojnameya Diyarî Kurdistan, li ser destê Salih Zekî bi zimanê Kurdî-Tirkî-Erebî dihate weşandin.

wekî çawa li Bakurê Kurdistan, dîsa li malbata Bedirxan li Rojavayê Kurdistanê xebatê çapemeniya kurdî dewam kirin, û rojnameyên mîna Hawar û Ronahî û Roja nû di salên 1932an de hatin çapkirin, û di salên 1943de hatin rawestandin ji ber astengiyên ku hikûmeta desthilatdar a Fernsî derdixst pêşberî rojnamegeriya kurdî.

Di dîroka nêz de çapemeniya kurd, pir zengîn û dewlemend e û xwedî Radyo, Televizyon , Kovar û Rojname ye, û wekî din hinek ji van alavên ragihandinê hata astekê xizmeta civaka kurd kirin, lê ji ber ne yekbûna hêzên siyasî kurdî, hişmendiya partîtî giranî dide li ser rêveçûna van rojnameyan, û bandora xwe li ser hinek beşên civakê dikirin, her bi wî rengî dewam kirin û nikarîbûn bibin çapemeniyek netewî.

Eger mirov dîroka kurd û kurdistan lêkolîn bike, mirov dê zanibe ku parçebûna di nava kurdan de, bûye sedema bidestnexistina mafê kurdan, û ji ber ku ev rastiya şaş û xemgîn nehatiye derbaskirin, binêre ku çawa li Bakurê Kurdistan, dîsa li malbata Bedirxan li Rojavayê Kurdistanê xebatê çapemeniya kurdî dewam kirin, û rojnameyên mîna Hawar û Ronahî û Roja nû di salên 1932an de hatin çapkirin, û di salên 1943de hatin rawestandin ji ber astengiyên ku hikûmeta desthilatdar a Fernsî derdixst pêşberî rojnamegeriya kurdî.

Di roja mey îro de em dibînin ku çapemeniya kurd, erkê xwe yê netewî bi cih nayîne û hê bêhtir bercewendiyên partîtî û hevreşkirin çêbûye û yê ku winda dike civaka kurd e, civaka kurd dibe qurbana hinek ragihandinên şofînîst, û bi taybet yên bi zimanê Erebî û Tirkî û Farisî weşanê dikin, û dixwazin wekî berê dîsa gelê me bixapînin û reş bikin û parçebikin û bixin xizmeta xwe de, û heger em vê kaosa Rojhilata Navîn bigrin ber çav, li Tûnis, Misir, Yemen, Lîbya, Sûrî, Îraqê, wê demê çapemeniya Erebî bi giranî digot Bihara Ereba, û miletê me bi giştî rewşa kaosa Rojhilata Navîn weke dihate xwestin fêr nebû, û ket bin bandora ragihandina şofînîst.

Me dît bê çawa bi navê muxalefeta Sûrî, ketin xizmeta bercewendiyên dewleta Tirk û Qatar û Siûdiyê û hêzên navnetewî de, û nêzîkbûna wan ji Kurda re mîna nêzîkbûna dewleta Tirk e, lê çapemeniya Kurd ev xeteriya han nedît, û di bin bandora mija siyasî de man û ev nêzîkbûn cihê dil nexweşiyê ye di civaka kurd de.

Di vê kaosê de, gelê me rastî êrîş û ambargo û şerên pîskolojî hatin û komkujiyên mîna Şengal û Kobanê, lê di rewşa wiha de çapemeniya kurd bi giştî kêm ma û nebû bersiv.

Hîn jî êşên giran hene, ji koçberiya ber bi Bakur û Başûr û ya herî bi êş ber bi Ewrûpa, ku di avê de fetisandin çêdibe bi destê çeteyên mirovan, û azarên gelê mey Êzîdî û yê koçberiya Kobanê.

Êşa Jina Kurd di vê kaosê de pir mezin e, bi hezaran keç û jinên Şengalê di destê çeteyên Daiş de ne, û koletiya giran jiyan dikin, û ev mijar di çapemeniya Kurdî de kêm maye?.

Hinek Saziyên çapemeniyê bi navê çapemeniya Kurdî, bandora xwe neyênî li ser çapemeniya Kurdî kirin, û her tiştê girêdayî çapemeniyê di bin bandora xwe de hiştin, û peyamnêr jê xilas nebûn.

Gelê kurd, ji van kêmasiya parçe ma û ji vê valatiyê hinekî ma windayî, rê lê şaş bû û hineka xwe bê xwedî dîtin, û baş li berpirsyariya xwe derneketin.

Her kes dizane ku çapemenî, çav, guh, zimanê gelan e, û her em dizanin çapemenî ronahiya civakê ye, û ji bo ku çapemeniya kurdî bighêje asta herî baş û yekrêz, divê giranî bidin ser aliyên siyasî û civakî. Kongirek netewî wan bicivînin û bibin kurdek yekrêz, parçebûnek siyasî em jiyan dikin, û diplomasiyek lewaz û ne yekbûnek leşkerî û aborî, û xebatekî çandî pir giran bi rê ve diçe.

Eger kongra netewî çêbibe, wê rê li ber xeteriya teva were girtin, eger tevgera siyasî û hêza leşkerî, aborî , diplomasî, û çapemenî bibe yek, em ê karibin rola pêşengtiyê di herêmê de bilîzin, wê demê çapemeniya kurd wê rêka rastiyê nîşanî gelê kurd bike, û wê ji bin bandora çapemeniya şofînîst ya Ereb û Tirk xilas bibe, ji hêleke din ve çapemeniya Kurdî bi rêka weşana xwe, bi zimanê İnglîzî û Ferensî dikare rastiyê bighîne civaka navnetewî, û têkiliyê gelê kurd bi gelên cîhanê re pêş bixe, her wiha çapemenî dikare bibe xwedî bandor li ser qada siyasî, û diplomasî û dikare xizmetê ji yekrêziya kurdan re bike.

Pêwîst e em giraniyê bidin ser medya civakî ku piraniya gel û bi taybet ciwan giranî dane ser Facebook û Twîtter, pêşengtî were kirin ku ev medya bi awayekî netewî û durust were bikaranîn, di rêka medya civakî de çapemeniya Ereb dikarîbû bibe xwedî bandor li ser Ciwanên Kurd, û wan ji rastiya şoreşa Rojava bidin dûrxistin, ev erk dikeve ser milê rojnamevan û çapgeriya kurdî ku karibe, ciwanên kurd û civaka kurd bi giştî ji bandora çapemeniya şofînîst û dijkar xilas bike, û bixe rêka bercewndiyên gel û yekrêziya tevgera siyasî Kurdî.

Çawa çapemenî û ragihandin Guh û Çav û Zimanê gel e, her wiha ew pêwîst e heman demê Wicdanê civakê be, û bi hişmendî û hişyariyek netewî û insanî û meslekî karibin vî erkê xwe yê çapemeniyê bikin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Kesek Heye Wî Nas Nake..!? «Hoste Koko» Kevintirîn Wênekêş Li Ser Riwê Dinyayê, Ji Qamişlo Ye!.

- Min wêneyê Cemal Ebdulnasir û serokê Sûriyayê Şikrî Elquwetlî kişandiye.
- Kurdekî Ermenî me, û ji bilî Kurdî malbata min na-axive.
- Ez û Aram Dîkran di şahiyan de ji hev qut nedibûn.
- Pirên wêneyên Seydayê Cegerxwîn min jê re kişandine.
- Kesekî berî min nerahişt kamîrê û negeriyaye, ev min tenê kirîye.
- Ez li Helebê bûm, Qamişlo ji bala min nediçû..!
- Min çar zaro hene, Xaçîk, Rafî, Mariya, Talar. tev bi Kurdî diaxvin, xanima min navê wê Losîn e, ew jî Kurdek Ermenî ye.
- Bavê min ji Amedê hatiye Sûriyayê, dema ku ez çêbûm Qamişlo nû ava bûbû. Bavê min Hentûrçî bû.
- Li bajarê Qamişlo hoste Karnîk yekem wênekêş bû.
- Navê diya min "Vîrcêt"bû, kebaniyek jêhatî bû, di mala xwe de xwedî êtîkêt bû..!

Ehmed Bavê Alan.

" Rojekê min li gulîstana bajêr wêne digirtin, pîrekek temenê wê dora 55 salan bû, bang li min kir, û ji min xwest ku ez wêneyan ji zaroka yek salî re bikşînim, paşê ew ê hermetê perê min dane min, û ji min re got: Apê Koko wêneyê min heye ez yek salî me, bavê min gote min ev Koko ji te re girtiye, e'ynî li vî cihî bû, vaya tu wêneyê neviya min dikşîne, Xwedê temenê te mezin bike".
Kesayetiyek mîna Hebsa Reş, mizgefta Qasimo, û dêra kevin naskirî ye, navdar û xwedî nav e, nabe ku kesek ji Qamişlo wî nasneke?

Kirîkor Xaçadoriyan, yê bi navê " Koko" tê naskirin li ser xwe dibêje: Ez li Qamişlo çêbûme, kurdekî Ermenî me, ji gundê Şimşimê me, bavê min ji Amedê hatiye Sûriyayê, dema ku ez çêbûm Qamişlo nû ava bûbû. Bavê min Hentûrçî bû, wisa em xwedî dikirin. Min 14 salî xwe berda bazara Qamişlo a ku di destpêka avakirinê de bû, li bazara Qamişlo giriyam pêrgî dikana wênegêşekî bûm, matmayî mam. Xwediyê dikanê yê wênekêş derket, ji min pirsî: Xêr e xorto ev bû se'tek û tu li dikana min dinêrî? Min got: Ez jixwe re li karekî digerim. Dîsan gote min: Tu dixwazî li rex min kar bikî? Dilşad bûm.Dîsan Karnîk got: Here mal, bavê xwe haydar bike. Li bajarê Qamişlo hoste Karnîk yekem wênekêş bû, wêneyên wî ji yên Heleb û Şam jî ciwantir bûn.

Ez çûm mal, ji xwe bavê min nîvê şevê dihat, karî wî pir zor bû. Diya min jî erêya xwe da min, wê şevê gelek kêfxweş bûn çimku ez ê sibe mîna bavê xwe bibim zilam. Buhayê karê min di îniyê de sêrib bûn, di kêmî salekê de ez hînî ji %60 ji karê girtin û sipîkirina wêneyan bûm, nêzî salekê heqdestê min sêrib bû. Piştî çend mehên min li rex Karnîk qediyan, xortekî Ermenî navê wî Arşo bû, dikanek wênekêşiyê vekir, Arşo pir jixwe hez dikir, du şagirtin wî hebûn" Vahî û Garo " Arşo dizanî ku ez çiqasî di karê xwe de jêhatî me, hay ji dikana Karnîk heme. Wî xwest ku min bibe rex xwe, ji min re got: "Tu jêhatî yî, ez dixwazim tu li rex min kar bikî, ez ê di îniyê de 4 wereqeyên kaxetî bidim te. Ez wê çaxê ji kêfa 4 wereqeyan re dîn bûm, min dîsan rêdana diya xwe xwest, wê tucarî dilê min nedihişt, navê wê "Vîrcêt"bû, kebaniyek jêhatî bû, di mala xwe de xwedî êtîkêt bû..!
Wisa ez li rex Arşo bûm şagirt, hostayê min Karnîk dengê xwe li ser Arşo hilda, lê Arşo jê re got: Tu 6 wereqeyan bidî Koko, dîsan wê vegere dikana te, ji vir Karnîk hew deng jêhat. Ez di dikana Arşo de zîrek bûm, carekê piştî ku hin pereyên min çêbûn diya min ji min re qapûtek kirî, "Vahî" û "Garo" hingî ji min aciz bûn qapûtê min qetandin, û roja wan li rex Arşo ya dawî bû, ez tenê mam di dikanê de.
Ez 16 salan li rex Arşo mam, di karê xwe de bûm hoste, navê min derket, kesekî berî min nerahişt kamîrê û negeriya, ev min tenê kirî ye..! Koko li Aheng û daweten, seyran, cejna Newrozê, gulistan, daristan, û li hemî deran amade bû, vê dawiyê heqdestê min gihişt 35 wereqeyên Sûrî, û min kar berdewam kir
Rojekê min ji Arşo re got: Ezbenî ez dixwazim ku ji xwe re kar bikim, Arşo matmayî nema, gote min: Baş e du mehan bimîne û oxra te ya xêrê be. Koko bû serbixwe, perê min li rex diya min 300 wereqe hebûn, min berê xwe da Helebê, ta ku ez alavên karê xwe bikirim. Min qesda Arko yekemîn wênekêş di Sûriyayê de kir, ji min re got: Ev tiştên tu dixwazî buhyê wan 550 wereqeyên Sûrî ne, lê eger tu carek dî hatî pereyê mayî bîne, min rahişt alavên xwe û berê xwe da Qamişlo.
Li Qamişlo, cihê karê min tune bû, pereyên min jî nemabûn, bavê min axurê hespê xwe da min, û hespê xwe li axurê cînarê me razand, min hundirê axur bi heriyê seyand, sipî kir, axur amade bû ku Koko karê xwe bike.
Min dest bi karê xwe yê taybet kir şev û roj min dikirin yek, di demek ne dirêj de, birayê min Manok hînî karê min bû, ji xwe min ew bira hebû tevlî du xwişkin min jî hebûn navê wan" Zabêl û Anahît".
Min û birayê xwe kar dikir û wêne dikşandin û sipî dikirin û ji xwediyê wan re jî dibirin, perê min çêbûn, 7000 kaxet ketin deste min de, di sala 1965an de min jin anî. Karê min berdewam bû, birayê min jî mezin bû, û wextê wî jî hat ku jinek xwe bîne, vêce min her tişt jê re hişt, û çend wereqeyên min hebûn, ez çûm Helebê, li wir min xanîk û dikanek kirîn, û dîsa dest bi karê wêneyan kir, li Helebê kar pir başbû, lê sebra min nedihat, Qamişlo ji bala min nediçû! Neçar mam ku ez ji karê xwe biqerim, û berê xwe bidim Qamişlo, çawa ku hunermend Se'îd Yûsif dibêje: " Qamişlo Bajarê Evînê Ye"..! wisa ez evîndarê Qamişlo û xelkê wê bûm. Tu dizanî ku em ji pêvî kurdî di mala xwe de naaxivin, ez, zarokên min, û wisa jî dê û bavê min. Bavê min digot: Bapîrê min jî bi kurdî diaxivî.
Li Qamişlo dîsan daketim wêneyan ji xelkê re bikşînim, li deveran wêneyan bikşînim, min ji karê dikanê hez nekir! Mixabin erşîfa min li rex birayê min ma û tev tertûbela bûn! Nizanim çûn ku? Ez dibêjim belkî min 6 meliyon wêne girtine, nayên hesêbê. Min wêneyê Cemal Ebdulnasir li ser belkona kurê Şêxê Şemeran girt, û wêneyên Serokê Sûriyayê Şikrî Elquwetlî jî girit,
û gelek wezîr û serok wezîrên Sûriyayê û yên mihvan jî dema dihatin parêzgiha Hisîça. wekî dî gelek kesayetiyên navdar jî hene ku min ji wan re wêne kişandine. Seydayê Cegerxwîn hema wêneyên wî li Qamişlo yên ku niha tên der û xelk bi mala xwe ve daliqandine min ew wêne kişandine! Gelek caran ez û Seyda pêrgî hev dibûn, yekser min wêneyek jêre dikşand, Seydayê Cegerxwîn digote min: Koko tu heme wêneyan ji min re dikşînî, û roja dî sipî dikî, û têne jimin re, ez hew bi perê wêneyên te ve dighim. Gelek jimin hez dikir, Xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike.
Rojekê ez û Aramê Dîkran çûn şahîya mala (Hebîbê Mêremo) Li Serêkaniyê. Dilê min ji kêfa re firiya, me xwe kar kir, min 15 fîlim bixwe re birin, û me berê xwe da Serêkaniyê, heft rojan şahîya wan dom kir, ma êdî min wêne gişandin, 700 wereqêyên Sûrî gihan min, û Aram Dîkran 3500 wereqe, ew şahî ji bîra min naçe tucarî.
Ax birazî, min di temenê xwe yê wênekêşî de, 3 Kam bikar anîne! Molîda, min ji Helebê bi 125 wereqan kirî, û yek Emrîkî bû ew ji destê min ket zû şikest, lê ya herî baş ku 28 salan ma bi min re kar kir(KF4) bû. Niha Kama min Normale, karê min diqedîne, jiber ku karê min pir kêm bûye, xelk tev kamê Dîcîtal û mobayîl bi wan re hene? Lê dîsan ez dibêjim karê min pirr bi dilê min e, eger jiyana min vegere dîsan ez ê xwe fêrî wênekêşiyê bikim.
Rojekê min li gulîstana bajêr wêne digirtin, pîrekek temenê wê dora 55 salan bû, bang li min kir, û ji min xwest ku ez wêneyan ji zaroka yek salî re bikşînim, paşê ew ê hermetê perê min dane min, û ji min re got: Apê Koko wêneyê min heye ez yek salî me, bavê min gote min ev Koko ji te re girtiye, e'ynî li vî cihî bû, vaya tu wêneyê neviya min dikşîne, Xwedê temenê te mezin bike.
Li vir Apê Koko rondik ji çavên wî hatin, û keserek mezin kişand û got: Nizanim çawe ez ê ji Qamişlo bar bikim. Tu nizanî çiqasî ez ji Qamişlo hezdikim. Niha ez her dem dîroka karê xwe ji zarokên xwe re dibêjim. Jixwe min jibîr kir navê zarokên xwe bêjim te. Min çar zaro hene, Xaçîk, Rafî, Mariya, Talar. tev bi kurdî diaxvin, xanima min navê wê Losîn e, ew jî kurdek Ermenî ye. mala wê ava, û hûn ji min re saxbin.
Têbînî: – Min gelek li ser gotinê Apê Koko zêde nekirin, 'eyînî wisa bi kurdî axivî, û yek gotina biyan ji devê wî derneket.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Dîmenek Dîrokî

Hewas Bişo

Piştî karekî giran, xebatek mezin û çûn û hatinên pirr, hemû serkirde, berpirsyarên civaka sivîl, rewşenbîr û nivîskar û wêjevan û kesên welatparêz yên Rojava li cihekî li hev civiyan û ez jî yek ji wan kesan bûm.

Bi rastî ew cih piçkî teng bû li gorî wê civîna mezin lê gellekî jî fireh bû li gorî xweşbûna wê rûniştinê. Dîmenek pirr xweşik bû, dilê min pirr pê re geş bû kesên bi temenê xwe mezin tê de hebûn.

Xortên ciwan û jin û keçên xweşik û hêja. Li paş maseyan, giş rûniştibûn. Çayê û qehwe li ber wan danîbûn. Bi nazikî û xweşikî vedixwarin, hinan ji wan çixare hêdî hêdî dikişandin, heçî nêzîkî hev devê xwe dixistin guhên hev, û dibû pistepista wan bi hev re dikeniyan.

Caran jî ji kêfa re destên xwe li destên hev dixistin bi rastî ez jî weke mirovekî Kurd bi kêf û dilgeş bûm.

Piştî demeke piçûk her tişt ji ser maseyan hat rahiştin û her serkirdeyek kaxezek û pênûsek li ber wî hat danîn, dest bi gotin û dîwanên xwe kirin. Gişan li ser yekîtiya gotin û helwesta Kurdî tekez kir. Ji ber ku mijara ku gelê Kurd tê re derbas dibe pirr giring û dijwar e.

Gotinên hemiyan wek hev bûn yan jî nêzîkî hev bûn û piştî her gotinekê dengê çepkan dighişte ezmanan. Di wan kêlîkan de hestin pirr germ û xweş dihatin min û kêfa min ji wan kesan re gelekî dihat. û piştî çend se'etan dawî hat li gotinan û di nav navbirekê de, Rojnamevan bi karê xwe rabûn, berpirsyarên me kincên xwe rast kirin û li kêleka alên Kurdî wêne kişandin, di pişt re bersivine bi kurtî dan rojnamevanan.

Û dûv re her kes vegeriya cihê xwe û dema herî xweş hat, dema şa nenavê li ser wê rêkeftinê ya ku bi cî anîn (Rêkeftina Yekîtiya Kurdên Rojava)

Berpirsyarê herî mezin bi temenê xwe rahişt pênûsa xwe û destê xwe nêzîkî kaxezê kir, di wê kêlîka dîrokî de bi dehan wêne jê re hatin kişandin û giş rabûn ser xwe û xwe amade kirin ji çepkan re.

Di wê demê de, dilê min bû mîna çivîkekî û dixwest bifire derveyî sînga min.

Xweştirîn hest hate min û hêsirê min hatin xwarê lê belê ji nişkave dengekî pirr xurt kete guhê min (qinêber, qinêber, pîvaz, pîvaz …) Min cavê xwe vekir û serê xwe rakir û li dora xwe min nerî, li vî alî û li wî alî, kesek ji bilî xwe min nedît..! Mixabin ez bi tena xwe bûm.

Carek din hêsirê min hatin xwarê... Gellkî hatin xwarê... Gellkî hatin xwarê..

Hêviyek

Dildarê Mîdî

Rêberê kurd bese êdî ev çi kîn û pitpit e
Li rewşa xwe baş binêre bila poz bişewite
Masiyê nava gerê bê hiş dilive rast û çep
Tu bû ye nîşan ji bo yac û macûc û qutqut e
Her di cejn û şahiyan de rastî komkujiyan tê
Tim li ser ezeziyê palda ye tû nalebite
Mîna gokê tu li ber lingê neyaran xweş diçê
Li tu cih û şûn û waran nalivê , na tebite
Te jibîr kir hûn biran e xwîn tucarî nabe av
Ne xema we ye bi carek, min ciger diperite
Şaş nebe, bê hiş nebe, pişta birê qet bernede
Tu qizinc nayên bi destê jar û qels û kitkit e
Pirsgirêka çêneke malê dinê bê fêde ye
Derfeta zêrîn biçê lingê te nû dişemite
Tê ji mewlûdê biçê destek li pêş û yek li paş
Agirê poşmaniyê di nav de tê bişewite
Lêbûrînê ger bixwazî, vaye min tû efû kir
Lê dîroka dilxerab nivîsa wê namerite
Rû qewîn û bê fihêt e wê li ruwê te bixê
Wê bibijê her ji vêde , bi qewir bi filite
Şaş û gêj tê nû bimînê li nav serê xwe bidê
Weken dînê şêtexanê bi kufkuf û fitfit e
Ey bira gazin meke ger min tecawiz kir li te
Ez wekû sing im di Erdê raserî min mêkute

Ez Xortê Kurd im.

Ez xortê Kurd im mêrxas û şervan
Ez im tekoşîn qîr û berxwdan
Nav û dengê min sera ser cîhan
Ez im ew Lolo Kordoxê Mîtan
Di qada şer de, ez im tolhildan
Ez im gir û kîn atom û volqan
Leheng im û şêr im pêşmergê Barzan
Ez li Qamişlo Efrîn û Koban
Welat bernadim erd here ezman
Ez im cangorî xaka Kurdistan
Xwînê dirijim ez im pakrewan
Ez im Erarat Hemrîn û Botan
Rajim çeka xwe derkevim çiyan
Ez ê rizgarkim axa Mîdiyan
Ez im Celewla Şengal û Zîlan
Arîna Kurd im Rûken û Şîlan
Ez im çarçira Qazî û Berzan
Nehrî û Seîd im, Mezlûmê Doxan
Ez im Qorqemaz Riza û Birhan
Helbest û rist im sirûda Hozan
Ez im YPG leheng û şervan
Hêrz û hinêrên keçên şoreşvan
Ez xortê Kurd im….



Seydayê Dilbirîn

Perwaneyek Têr Nebûyî Ji Firê

Dildarê Aştî

Û tu yî dilbera min
Perwaneyek têr nebûyî ji firê
Li baxin nû digere
Li şewqek nû
Henasên te
Xewnên min perûba dikin…
Bi rê dikevim
Rê bi saw e
ji hawîr
guleyên segvanan e
mûşeyên ji palbendan…
Hay ji xwe
Û hay dilê min hebe
ji finasên sêwlekên
ku di vê bablisokê de hatine
bi axa bin lingê te
rûdêmên xwe pak dikin…
Ez dizanim
Bi giyanê berxwedanê te hez kiriye
Evîna me bê hempa ye
Hingiv tê de tineye
Gezo tê de tineye
Tê de nîne civanê şaneşînan
Tê de
Kenê berî mirinê heye
dîlana li dor agir heye…
Û tê de Şeydabûna me
li ser rêçên azadiyê
Girêbendên xwe vedike…
zêrevaniyê li vejîna me dikin
li çelengiya
rêwiyên rêka pîroz….
li vedana kenê gulan
Tu dişibî Arîn a kobanê
Bi awatxwaziya xwe
Bê sînor e awira te…
Civanê me nêzîk bûye
Li peravên evê kêliya lavdar
Bihêtina giyanê xwe
me hiştiye
piştî vehesîna tozê
li ber dergehê doze….!!!

Çaxa Kulîlk Kizirandin

Fewaz Osê

Îro bi teqîna we, agirê
Newrozê geştir dibe
Ji qîrqîrê Nervîn û Alav
Dîwarê esmanan qul bûn
Sitêr ji xemgîniyê, xwe
Helweşandin
Lê, li ser zeviyê
me deng nekir
Gelo... Em tev kor û ker bûn
Em tev mest û bê hiş bûn
Yan em qirêja destê dijmin bûn
Helbet em ji hev cuda bûbûn.!
Bi ramenê xwe, ne azad bûn
nexweşê kursiyan bûn
Newroza birîndar..!
Perperîkê buharê
Dilopê xwîna paqij
Pekrewanê giranbuha
Laşê we bû paytexta Yezdanê
Dilovan...
Zengilê hovîtiyê jehra xwe
Li me barandin
Pizot bi dilovanî em
Himêz kirin
Şîrmij, dayik ciwan û kal
Bi bablîsoka xiniziyê hilandin
Lê,.. me deng nekir
Kul û birînên Newrozê vekirin
Kûra Amûdê û zindan
Hisîça nû kirin
Lê, me ..
Gul û mîran tê de çandin
Û bi Lîlav û Nêrgizan xemilandin
Lê mixabin dîlana me
Bi mij û dûman bû
Sar û xav bû,
Bêdeng û lal bû,
Dengê sirûda "Ey reqîb"
Nedihat me..!
rûreşî xwe ji we rûsipî kirin
gava guran dest û serî
li hev behir kirin û me li wa
dimeyzand..!
Çaxa gulîlk kizirandin
û rondikin Helebça li
bejna me barandin
û kevokên aştiyê
Mûzîk çêkirin..
lê, me deng ne kir
xwîna me diherike
goştê laşê me ji hev belev kirin
cejna me kirin şîn
lê, bazara biratiyê
berdewem dike
bi dawî nabe
pencên nandoza çikandin
di giyanê me de
û toza bêbextiyê li hev belav kirin
xewna yekîtiya pekrewanan
bi darve kirin
me didît û me deng dikir!!?
Gelo.. We nedît,... we deng nekir ..
gelo we nedît we deng nekir!!??

Bes e Yarê!

Dilawerê Zengî

Te cana can, li baxê dil Sebat canê bibînim ez
Şeva tarî, li ber çavan ne sawêr bî hilînim ez
Temaşakim, te nabînim, bi derdê dil birîn im ez
Bi ah û ox, bi fîxan im, wekî bilbil dixwînim ez
Birîndarê, bi hêviya ji rewş û dîtina cana
Disotî dil, ji axîn û ji nalîn û ji kovana
Ji pêta ar birînkûr û xewa min bir, hemî jana
Nehatî ser nesaxê nav livîn û êş, bi dermana
Ne min hêz ma ne ling û çog ne per û bast, li rû yara
Ne pêjn û deng ne hilm û ba ne hilbûna, ji cihwara
Ne zar û peyv ne roniya, ji çava ma, li xembara
Girî û kel, bi fermiskan, bi coş tên der, li şûn yara
Ne axiftî dilopek xwîn, ji derba wê kevan û tîr
Ji laşê bê rewa û can, çi wê derbî, ji çerm û çîr
Ne bes yarê te ez kuştim, gelek wek min ciwan û pîr
Di vê rêka Memê Alan rewanpak im, ji derba şîr.

Dîwana ARYA Derket



Pirtûk:ARYA -helbest
1 Babet: helbest
Hûrbîniya rênivîsê:Ronîstêr mîrza
Nivîskar: ELÎ ÇIL AXA
Kompiyûtir û derhênan: Ronîstêr mîrza
tîplêdan:Derax çil axa
Nexşekêşana qab:Hisên omer
Çapa yekem:2015 z
Laneya PERWA ya çap û nivîsê li Girkê legê
Telîfon :745093-754840

Eve Îro Li Rojava Hesînça Min Birîndar e

Di dîrokê de tê gotin li penda û ji kevnara
Li ba kurd heye (mehreşk) diyar e ew jî adar e
Di vê mangê gelek asteng ketin rêka gelê kurdî
Di çaxê ezdehakî de niha nayêne hejmara
Ji nêzîk ve li vê mahê Helebça bû şehîd tê de
Bi xaza xerdel û siyanîd ji layên hov û keftara
Bidî wê de li Qamişlo rêjîm lê gulebarandin
Dehên xortan şehîd ketin ji sala bîst sed û çara
Felaket berdewamin hê heya anha nerawestiya
Eve îro li rojava Hesînça min birîndar e
Şeva êvara newrozê dema gel hate ba hevdû
Bi ahing û bi coşên germ ji cejnê geş bikin ar e
Tirora alreş û reşkîn du teqînkir li meydanê
Di encam da sitêrên kurd ji ezmana rijîn xwar e
Li gorî peyvê çavdêra wekû mehşer li wir rabû
Şewat û dû li alîkî li cîkî qîr û hawar e
Dehên terman li erdê man zemîn sor bû ji xwîna gel
Şehîd nayên ji hev nasîn ku qîz e, xort e, xityar e
Di rewşa reş neşêt bêjim ku rêzdarê şehîda me
Ev e nûçe weşandîne ji bo bînêr û guhdara
Vedenga bûyerê dûr çû giha paytextê dinyayê
Li vir koma hawar çûnê bilez hatin ji bajara
Felaket pir mezin bû lê îrada kurd ne rûxandî
Ji ber gel berxwedanê re xweragirtê pesindar e
Di bê derba tu pê nemrî te pê xurtir dibî lewra
Di dîroka gelê me ji vê pendê pêşinyar e
Eger adar reş û şînê bi ser kurda de tim tînê
Ne wata ku pelên sipî di nav wê de ne hevpar e
Nimûne ji bûyera bûrî li şarê Hesekê rûda

Hadî Behlewî Nûhat

Li misteşfayê mendalek ji teqînê ne bêpar e
Di cil û bergê cengê de xwerapêçand dibû wîna
Tifinga wî li ber palê bi peyamê ra beşdar e
Ji bo bûyer bişopînin ji medyayê re raghînin
Ewî lawê temen zaro dida bersiv ji pirsa re
Digo gava teqîn çêbû ji tirsa xelk ji hev dûr bûn.
Revîn bêgo bizanin ka çi rûdaye çi kiryar e
Mi jî bazda di nav komê mebesta min ku aram bim
Ji ber xeyrî bezê pêve ji xelkê re nema çar e
Li dor min hin ket û rabûn hina gazî dikir hevdû
Mi dî ez jî birîndar bûm lê derba min ne dijwar e
Di dawî de spasek germ bi jor şandî ji Yezdan re
Ku karîbû tifinga xwe xelaskî tevlî ku dar e
Bigorî bim biçûkê kurd tifinga te li ser çava
Gelê wek te di nav de bin qira wê nayê yek cara
Di mînakê diyar e ku mesacek bi du çenga ye
Yekem jê bo yî dijmin re û ya din jî ji kurda re
Di vê gel dest bidin dest hev ji armancê re yek bin tev
Rik û nakokiyan dûr xin bi dilsozî herin kara
Weya din jî ji dijmin re ku pîlanê duhûnî tû
Dezî xav e xwe pev nagre temen kurt e bi roja re
Ji ser xaka xwe em narin di qirka ted wekî xar in
Bi xwîna xwe diparêzin welat û çand û şûnwara.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Belgefîlmek Li Ser Jiyan Aram Dîkran Hat Weşandin

Li hola navenda Subartu li bajarê Qamişlo Belgefîlmek li ser jiyana hunermenê Aram Dîkar hat weşandin.

Fîlmê Aram Dîkran bi strana wî ya herî navdar "Ey Dilberê" destpê kir.

Di naveroka fîlmê Aram Dîkra de, bêtirî xwe li ser jiyana wî û kesayetiya wî ya Ermenî û zimanê wî yê stranbêjî û axeftinê yê bi kurdî bû, ew zimanê ku Aram Dîkran li ser wiha gotiye:" Ji vî zimanî hez dikim, û hemû stranên min bi zimanê kurdî ne". Tevlî ku ew bi zimanê Ermenî û Erebî jî dizane.

Hunermendê navdar Aram Dîkran di sala 1934an de, li bajarê Qamişlo ji dayik bûye, û strana pêşî ku Aram Dîkran gotiye ji helbestên Seydayê Cegerxwîn bû, berî 25 salan ew koçberî Ermîniya û Ewropayê bûbû, û piştî koçberiyê hunermend Dîkran bêtir guh da hunera Kurdî û bi dehê stranên ku niha ketina pertûkxaniya mûzîlka Kurdî de wek strana "Zimanê Kurdî" çêkirin. Ev strana ku mirov dikare bêje û bibe berpisyar di ber gotina xwe de, ku bêtirî ji 25 melyon kurd ew stran ezber kirine, jiber ku Aram Dîkran ji hezkirina wî ya bêhampe ji zimanê kurdî re, hiştiye ku kurd bêtir ji zimanê xwe hez bikin.

Partiya P.Y.K.S.Y (Elwihdê) Roja Rojnamegeriya Kurdî Lidar Xist

Li Ofêsa xwe P.Y.K.S.Y ahengek bi sebareta roja rojnamegeriya Kurdî lidar xist, despêk demek kurt li ser giyanê pakrewanên Kurd û kurdistanê rawestiyan, paşê birêz Hisên Bedir gotina partiyê xwend, û ev roj li hemû rojnamevan û ragihêneran pîroz kir. Êdî Mamoste Newaf Bavê Dara gotinek xwend, û li ser sergotara Rojnameya Kurdistan axivî, û tê de diyar kir ku Mîr Miqdad Bedirxan çi ji weşana vê kovarê dixwest û mebesta wî ya sereke çibû. Gotina Zaziya Fêrkirin û parastina zimanê Kurdî ji hêla Ednan Silêman ve hat xwendin. Êdî Çend helbest jî bo vê boneyê hatin xwendin, û di dawî de partiya yekîtî "Al Wehdê" Serkirdeyê xwe yê gurbuhiştî nivîskar û damezrênerê Kovara Newroz Kemal Henan xelat kirin, û birêz Mustefa Meşayîx cîgirê serokê P.Y.K.S.Y, xelata wî wergirt.

Ez Ne Tenê Me ..

Bi siponseriya "Navenda "Newroz" Bo Avakirina Civaka Sivîl, "Komela Hêlîn" ya zarokan, û "Komela Nûjiyan" ya guhdêra kesên astendar, helmeta " Ez Ne Tenê Me " li bajarê Amûdê hat destpêkirin. Hêjayê gotinê ku ev pirojeyek veweşanadinî ye, ji bo zarokan di van rewşên awarte de biparêzin, û armanc ji vê projeyê ew e ku zarokan li hemû deverên Sûriyê bighînin hev û bi taybet zarokên astendar. Ev helmet wê du mehan berdewam bike, heftiyê du caran Şemî û pêncşem, navend li bajarê Amûdê ye..

Pirtika Berfê (Romana Nêj)

Zahid Mehmûd

Gava tu nas bikî bê çawa miletên din dijîn, gava tu nêzî jiyana wan, û teybetmendiya wan a cuda bipelîne, wê wateya nivîsandin û xwendinê bi çêjbe. Biraştî be, gelekî xweş be, bi, sûd be. Ji ber ku xweştirîn tişt ew in ê ku hîn çav li wan neketiye lewra dema em devê romanekê, berhevokekê ji kesekî biyanî re vedikin, divabê em bi zimanê wî kesî zanibin yan jî berhem, wergerandî zimanê te be û li vir ez ê derbasî mijara xwe bibim.

"Nêj", romanek bi ferensî hatiye afirandin, bi dest û hiş û ramanên Maksans Fêrmîn-derfeta xwendina wê xwe avêt destê min. Ez di hundirê jiyana bûyerên romanê de pûnijîm.

Divabê bêjim ku wergirandina vê berhemê bi zimanê Kurdî ez bihûrgulî li nav peyîv û hevokan de begerim, û bi vê helkeftê ji erkê min e, spasiya mamoste Ibrahîm Xelîl bikim ji bo wergirandina wî ji vê romanê re..

Nêj kevalek tijî lebat û can e, daner, pif kiriye, ta ku jiyan ji mirinê derçûye, li hawîrdorî "Yûko" firiya ye, hêvî geş kirine, şêna mirovan ta dawî te'zî kiriye, wêrekî di cegeran de çandiye. Bi rastî "hayko", berf, pirtika berfê, tevgera welat û miletekî ye? çawaya pêkve jiyanê ye, çawaya ramyariya wan e, şêweyên derbaskirina rojên wan e û destnîşankirina mebest û armancên wan e, yên ku ciyawaz û cuda ji şêweyên jiyana kesên me yên ku hîn di avakirina kesayetiya xwe de serast nebûne, di hundirê tirs û gomanan de dijîn ta ev rojê.

Yûko Akîta xortek ciwan nûhatî, li başûrê Yabanê didome- Kiyoşo- bi bavê xwe re, di nîsana 1884an de hivde salan temam dike, bersiva pirsa bavê xwe dide dibêje, ez ê bibim helbestvan.

Hezkirina helbestên Hayko yên kurt daketibû dilê wî, hestê wî diguvaşt û di heman demê de hezkirina berfa sipî, newekî pêşiyên xwe yên ku dibû evser di leşkerê Yabanê de yan jî Koçek, ta ku gêncê çeleng her roj berê xwe dida quntara çiyayê Elp, helbest di bin dara qeresiyê de didarizandin, jiyana wî bi temamî dibû yariya li ser berfa şemîtonkî, û navê wî di nav gel de belav dibû.

Bi vî hawî helbestvanê şahê Yabanê pê dibhîze û di gel qîzek xwedan şewq û şemal serdana wî dike, jê dixwaze ku xwe fêrî hunera rengan û netenê rengê sipî bike, berê lawik dide bakurê Yabanê da ku helbestvanê gewre "Sûzûkî" bibîne, û tevlî hemî astengên wê pêrgî wî bibin. Berê xwe da bakur û berf, bager, serma û bahoz nas dikir, lê nizanîbû ku rêwîtiya wî, wê wî derbasî sosret û ezmûnên nedîtî bike.

Diweste û birçî dibe, xwe tavêje derperîna latekî reş û tarî hilma mirinê derbasî pozê wî dibe, diveciniqe dê ji hişê xwe here, dema hember xwe li rexê din meyze dikir, Peryek ji periyê xwenên xwe didît, lê mirî, hişk bûyî, te'zî di nava qeşayê de ye, lawik matmayî dimîne, şeva xwe di tirsê de derbas dike, û xewê nake, tenê dipirse ev candek li vir çidike? çawa hewqas xweşik û nazik e, ev kî ye?

Di berê sibê de Yûko gora jinikê nîşan dike, xaçekî diçikîne û li Sûzûkî digere, hemî tişt, berf, di hemêza wî de vîneke bihêz heye, pêdariyek û arazûyek bêhempa ew bi ber dergehê mala Sûzûkî de diajot, ta ku pêrgî navmaliyê wî dibe, Sûzûkî dibîne, hema kor û kal e, bawer nedikir ku ew ê wî fêrî hunera rengan bike.

Yûko, bi awayekî sosret hilkişiya avahiya jiyana helbestvan û hunermendan, dikarîbû sûd bigire, ezmûn û serpêhatiyê Sûzûkî bidest bixe û xwe wekî xwe birêve dibe, xwe wek lawikê helbestvan ava dike. Hingî ku ji bûyera ku bi rê de dîtibû matmayî mabû, ji bîra wî nediçu, radibe ji Sûzûkî re dibêje, rewş û pesnê wê dide, û keseran dikişîne, Sûzûkî jî bi van peyvan di cî de tê guvaştin. Roja dî, Sûzûkî lê mikur tê û dibêje, ew jinik hevjîna min e, behelewana meşa li ser werîsan bû di nav çiyayan de, hatibû xwar û winda bûbû, bidestê Yûko digire û dide pêşiya xwe ta ku digihe ser termê jinikê û xwe dirêj dike û dimire, Yûko vedigere malê, derbasî kargeha xwe dibe, derî qepat dike, çend rojan dernakeve, wêneyan li ser emûna xwe nîgar dike tenê qîza ku bi helbestvanê eywana şahê Yabanê re serdana wî kiribû li derî dixe, û jêre derî vedike, û di cî de dicemide, û li wêneya ku li ser dîwar nîgar kirî meyze dike, û dibêje ev dayika min e..!

Ew keçik pirtika buharê bû, keça wê jinikê bû, Sûzûkî bavê wê bû. Gelek bûyer û çîrokên dî di naveroka romana "Nêj" de hene, ev tenê hindik ji wan e.

Ji Serpêhatiyên Reşîdê Dalînî

Çêleka Teyman

Dibêjin di sala 1958 de, teymanek ji eskerê tirk, li gûndê Kertiwênê yê Bakurê gundê Xalid Gilo, ji hêla Serxetê ve dimîne, çêlekek peyda kiribû, ew çêlek beradayî û ziyanoker bû, dikete werz û bexçê xelkê de, û ti kesî ne diwêrîbû pê re deng bike.

Rojekê çêleka Teyman, dikeve werzekî ji gundê Xalid Gilo, û ziyanek mezin digihîne werz, xwediyê werz dibêje ez nizanim çebikim ji vê çêlekê, çêleka Teymana, Reşîdê Dalînî dibêje, tê destûra min bide, ez ê wê çêlekê bînim mal, xwediyê werz ne diwêrî bû, û ditirsiya ku bela jê re werin, lê dawî got: "Reşîdo destûra te bi te re ye."

Ew roj çû, roja din dîsa çêlek ket nav werz de, Reşîdo çû çêlek ji nav werz derxist, û çêlek anî mal. Û çêlek êdî nema xuya bû!? Yê Teyman lê pirsî û bihîst ku li gundê Xalid Gilo ye, rabû nehtorçiyê xwe şiyand da çêlekê bîne. Lê Reşîdo ne daye, rabû Teyman leşkerê xwe amade kirin û ji Reşîdo re şiyand û got: "Eger hûn çêlekê ne berdin em amede ne ku erîşê berdin ser gund". Reşîdo ji yê nehtorçî re got:" Ez ê topan bavêjim we eger hûn êrîşê berdin ser gundê me.

Yê nehturçî vegeriya, û Reşîdo sopa tepika derxist ser banê xwe, û berê lûlê da leşkerên Tirkan yên li ber sînor, yê nehturçî giha li rex leşkeran, jê re gotin: "Ew çi ye wisa li ser wî banî xuya dike"?

Got:" Çêlek nedane min, û ew tiştê xuya dike, lûla topê ye, û berê wê daye me". Yekser leşkerên Tirkan xwe avêtin erdê ji tirsa lûla topa Reşîdo. Nezîrê Betê, bihîst ku Reşîdo wilo kiriye, rabû çêlek berda berî ku şerek mezin di nav her dû dewletan de çêbibe! û ji wê rojê ve, êdî nema hiştin ku çêlek ziyanê bike. Xwediyê werz ji Reşîdo re got: "Bi xwedê, te îro bihna min berda, eger mirov li ber xwe nede wê xelk li wan siwar bibin"..

Tifing Ji Dest Xist

Dibêjin ku rojekê Reşîdo pezê xwe di beyarê ku Tirakan di nav xwe û Sûrî de bombe kiribû diçêrand. Pezê wî jî bi çêrandina geyayê ber sînor mijûl e, Reşîdo jî paldayî ye, û çavê wî li Pezê wî ye, serbazekî tirkan hat nêzîkî pez û berê tifinga xwe da Reşîdo, guleyek bi ser Rêşîdo ve berda, bi avîtina vê guleyê re, pezê Reşîdo tirsya û li hev civiya. Reşîdo jî feqîro ji tirsa xwe berda cobareke avê, û her ku serê xwe hildida guleyek di ser Reşîdo re dihat avêtin.

Reşîdo di cihê xwe de dirûnişt, ê Tirik dikenî û hin û hin xwe nêzîkî Reşîdo dikir, dibêjin ku Reşîdo ji nîşkê ve rahişte kevirekî, û avête yê serbaz.! Kevir jî li destê yê serbazê tirk dikeve, û tifing ji destê wî napeke!? Hema Reşîdo nake didu û dirahêje tifingê û dixe pişta yê serbaz de, û berî wî dide gundê Xalid Gilo, wî dibe li cem Nezîrê Alîkê Betê, çaxa ku Nezîrê Betê vî dîmenî wisa dibîne ji Reşîdo re dibêje: "Kuro hawara te çikiriye, zû tifinga wî bidiyê û bila here, me barê Tirakn nîne"..!?

Amedekirin: Behdîn Şakir

Rêxistina Mafê Mirovan Li Rojavayê Kurdistan Kongira Xwe Yê Dûyemîn Lidar Xist.

Rêxistna mafê mirovan ku berevaniyê di ber mafê mirovan li Rojavayê Kurdistanê dike li bajarê Qamişlo û li navenda Mihemed Şêxo ya çand û hunerê kongirê xwe yê dûyemîn lidar xist. kongir bi demek bêdeng li ser giyanê pakrewanên Kurd, Ermen, Suryan destpê kir.

Evîn Cum'a hevseroka rêxistna mafê mirovan li Rojavayê Kurdistanê gotina rêxistnê xwend û tê de got:" Ku ev rêxistin rolek mezin di vê qonaxa hestiyar de lîst, hemû karmendên xwe ji bo wekheviyê û azadiyê di civaka kurdî de biçespînin suxurandibûn.

Ebdulbaqî Ibrahîm serokê vê rêxistinê yê berê, di gotina xwe de behsa komkujiya Ermenan kir, û bi awakî mafnasî li ser axivî.

Gotina Saziyên Civaka Sivîl ji hêla Miş'el Emîn ve hat xwendin.

Gotina Saziyên Dadweriyê Heyder Heyder xwend, Senherîb Bersom Serokê desteya Mafê mirovan di rêvebiriya xweser de xwend, û parêzer Ebdulselam Ehmed Gotina Tevgera (Tev-Dem) xwend. Piştî xwendina hemû gotinan mêvanan xatir xwestin, û endamê kongir karê xwe berdwam kirin.

Li Bajarê Amûdê Sîmînarek Li Ser Sîstema " Kota" Hat lidarxistin

Bi sponseriya Komîta Gulîşîna, li navenda Orkêş Birêz Enwer Naso Endamê Komîta Navendî Ya Partiya "Yekîtî" sîmînarek bi navê "Kota" pêşkêş kir.

Bi xuleyeke bê deng sîmînar destpê bû, piştre Enwer Naso li ser sîstema "Kota" di hilbijartinê de axivî, û şîrove kir, ku ew bixwe rêjeya jinê di hilbijartinan de dide nasîn û çareser dike, û diyar kir ku nayê wê wateyê ku jin her û her bi sîstema Kota bê diyarkirin, û got: " Divê beşdarbûna jinê rasteqîn be, û bi wate be, ta ku jin jî bi rola xwe rabe û rola wê aktîv bibe, di hemû gastînan de, hetanî ew jî karibe di cihê birayrê de nerîn û biriyara xwe misoger bike".

Û di gotina xwe de Naso tekez kir ku neaktîvbûna jinê û qelsbûna karê wê vedigere sedemên ku çanada civakî ya kurdî başamayî maye, û herwiha rola Olî û malbatî.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Li Herêma Kurdistanê welatiya bi navê Hêvî li ba-jarê Raniyeyê bi duçerxeyê (bisîklet) diçe zanîngehê

Hêvî li Başûrê Kurdistanê keça yekemîn e ku bi bisîkletê diçe zanîngehê.

Hêvî anî ziman ji ber ku li herêmê jin, li duçerxe sar nabin ew bala welatiyên gellek dikişîne û wiha got: "Di mijarê de malbata min piştgirî da min. Herwiha di rojên serî de bavê min heroj ligel min hevaletî dikir û heta zanîngehê dihat."

Rêveberirê Fakulteya Perwerdeya Zanîngeha Raperinê Ehmed Mehmûd jî ji Rûdawê re diyar kir, li herêmê ajotina duçerxeyan weke fedî tê dîtin û wiha got: "Ev şaşî tenê dikare bi perwerdeyê ji holê rabe."

Amadekirin: Xoşnav Heso

kurdî Xweş e

Zelûlî	خُشوع
Pevketin	خِصام
Tevlihevkirin	خَلط
Şane	خلية
Hogir	خَليل
Cihnişînî	خِلافة
Arî	رَماد
Qûm	رمل
Dîdevanî	رَقابة
Saw	رَهبة

Peyva Wendayî

p	e	N	c	e	w	î	n	d	d
r	ş	l	d	m	x	ş	r	q	i
o	o	E	ê	a	e	î	a	e	l
j	d	L	h	l	w	l	y	r	b
h	h	Ê	ş	r	n	a	h	m	i
i	r	Ê	r	i	e	n	a	a	x
l	s	ê	v	i	m	z	ş	n	w
a	b	a	z	o	k	a	o	ê	î
t	ş	e	m	a	l	ê	q	r	n
s	e	m	a	w	e	n	d	o	k

(şahyar-qermanê-xwen-mal-dê-sêv-rê-şîlan-pencewîn-semawend-dilbixwîn-qamişlo-dêrikê-bazo-rojhilat-şehrezor-şemal).

Peyva wendayî ji 5 tîpa pêktê,nave parêzgehek Kurdî ye.

Hejmara Bûrî

	K	o	b	a	n	Ê

Hejmara Bûrî

3	5	1	8	4	9	6	2	7
6	8	7	2	1	3	9	5	4
9	4	2	6	5	7	1	8	3
8	2	5	3	9	1	7	4	6
7	1	9	4	6	2	5	3	8
4	3	6	5	7	8	2	9	1
5	7	4	9	8	6	3	1	2
1	9	3	7	2	4	8	6	5
2	6	8	1	3	5	4	7	9

Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre,lê divê ku tenê carekê jimar were dagirtin di her malikê de,û herwiha tenê carekê were dagirtin li ser xêza asoyî û serjêr.

5				6	8	7		4
7			3				1	9
8	2		9			6		5
2				7	6		8	1
9		7	5				6	2
1	6	4	2			5	7	
		2			4	1		8
		5					4	
4	1				5	2		6

Aqil Di Pendên Kurdî De

1-Bi girî kar nare serî !
2-Ji ser deve ketiye,û ji hop hopê namîne !
3-Haya wî ji bayê felekê jî tune ye !
4-Şeva reş ji êvar de reş e !
5-Xwedê nokan dide yên bê diran !
6-Kesekî destê camêra negirtiye !
7-Baş be,lê ne bi belaş be !
8-Aşê nezanan ji xweber digere !
9-Dawiya şevê her dem sibe ye !
10-Îro mîvan e,sibe cîran e û du sibe gundî ye !

Zûbêjj

Şîrê şêra şor bûye,şemşûrê şêxa ko bûye

Mamik???

- Heba noka bi derzî, mar ji ber dibezî?
- Vekirî kon e, girtî gopal e?
- Di avê de pêlewan e, li bejayê bê can e?

Bersiva Hejmara 17an:Hîv û Stêrk- Pêsîra Dê - Zînê Hesp

Xaçerêz

Rast

1-taya bi du hestên nakok navdar e.
2-sewda û şeydabûn.
3-zagon – mû di rû de şîn tên.
4-çemek li Rojavayê Kurdistanê de ye.
5-tiştê ku av bi ser de dadibe-sinc(b).
6-paytexta Nerwij-ta.
7-sê tîp wek hev-rojek ji hefteyê(b).

Serjêr

1-belê bi Ingilîzî(b)-gavdan û rêdan.
2-navekî keçan e (b).
3-tayê ku ji hiriyê-sê tîp wek hev.
4-xanî li gorî devika Soranî(b)-kêşeya baweriyê.
5-agir.
6-bo nîşana nêzîk-derî bi Erebî.
7-kesê ku rûyê wî li ken be.
8-yê ku welatiyê Îranê be.



Hejmara Bûrî

	1	2	3	4	5	6	7
1	l	a	w	e	r		Î
2	o		a	n	e		T
3	r	o	n	a	k		A
4	î		e	x	l	a	Q
5	n	o		y	a	r	Î
6		s		a	m	î	D
7	d	a	r	ç	î	n	